

## Ev sendîkaya Kommunalê ye

**Zêdetir ji 500 000 kesan endamên Kommunalê ne. Em di 230 pîşeyên cuda de hene û em stûna refahiyeta Swêdê ne. Em karên giring û xweş dikin û pê serbilind in.**

Hejmara me ya zêde gelek qezencan dide te. Şebekeyeka parastinê ya fireh, zanîna civandî û hêza peydakirina guherînê bi dest te dikeve. Bi gotineka din, pêşdeçûneka zêdetir, haydarbûneka zêdetir û ewlehîyeka zêdetir ji te re peyda dibin.

Endamên ku di Kommunalê de ne sexbêriya pîran dikin, xwarinê ji şagirdên dibistanan re çê dikin û li zarokxaneyan û cihên demvalahîyê çavê xwe didin zarokên. Em otobusan diajon, agirana vedimirînin, rojin û pixêriyan ji tenîyê paqij dikin û ambulansan diajon. Dîsan em in yê ku çavdêriya heywanên baxçeyên heywanan dikin, sexbêriya giyayê meydana golfê dikin makîneyên dirûnê li kêlgehê gundan diajon.

### **Kommunal ji bo endaman e**

Kommunal di bazara karî û civakê de çavê xwe dide berjewendiyên endaman. Kardariyên baş, jîngeheka karî ya baş û tesîrkirin di karî de heqê her kesî ye. Em dixebitin jî ku heqê endaman hebe ku bixwînin û di pîşeyên xwe de bên pêde birin.

### **Karê navneteweyî**

Kommunal dixwaze tesîrê li ser şertên karî li beşên din yê cîhanê bike. Em vê xebatê bi hev re li gel sendîkayên navneteweyî dikin û bi rêya - bo nimûne - hewildana ku tesîrê li ser biryarên ku Yekîtiya Ewropayê dide dikin.

### **Bibe endam**

Wek endamê Kommunalê, alîkarî ji bo pêşdebirina te û karê te ji te re tê pêşkêş kirin. Şîretên pisporan derbarê pîşeya te û alîkarî heger bûyereka biqewime ji te re tê pêşkêş kirin. Her weha temînata xaniyê û temînata qeza û bûyerê yê herî baş di bazarê de di nav endambûnê de hene.

Tu dixwazî bibî endam yan pirseka te li ser endambûnê heye? Tu bi rêya telefona 010-442 70 00 têkiliyê bi me dikî.